Rapora YASA ya mehane
Navenda Kurdî ji bo Lêkolîn û Rawêjkariya Yasayî

Tîrmeh 2009

YA§A e.V.

Kurdish Centre for Legal Studies and Consultancy

Kurdisches Zentrum für juristische Studien und Beratungen

Navenda kurdî ji bo lêkolîn û rawêjkarîya yasayî

المركز الكردي للدراسات والاستشارات القانونية

YASA e.V.
Postfach 7624
53076 Bonn
www.yasa-online.org

Emced Osman

Navenda YASA ji bo lêkolîn û rawêjkariyên yasayî dê mehane raporekê der barê rewşa mafên mirovê kurd li sûriyê biweşîne. YASA dê bi alîkariya gelek rêxistinên mafên mirovan li sûriyê, jêder û çavkaniyan rapora xwe ya mehane bi 4 zimanan (Kurdî, erebî, ingilîzî û elmanî) amade bike.

Naverok:

- **Sûriyê: Divê navên dikanan bibin erebî!**
- **Xortekî kurd ku wendayî bû vegeriya mala xwe**
- **Heya aniha çarenivîsa hevwelatî û rojnamevanê kurd Emced Ebdil Rehman Osman ne diyar e!**
- **Leşkerekî kurd li bajarê Himsê hate kuştin!**
- **Ji ber ku wêneyên Mam Celal û Kak Mesûd pê re hatin dîtin, yekser hate binçavkirin.**
- **Hêzên ewlekariyê êrîş birin ser mala kurdekî û ew binçav kirin**
- **Sê xortên kurd ji qamişlo hatin binçavkirin**
- **Sê meh borîn û hîna çarenivîsa Fewaz Ehmed Hesen ne diyar e**
- **Silêman Cemîl Cafer serbest hate berdan**
- **Ji ber ku Mîdya nasnameya wê ya sûrî tuneye, ne hiştin ku biçe Şamê!!!**
- **Rodî Mehmûd Şêxo azad e**
- **Çalakvanekî kurd î mafmend bo şaxê Felestînê yê ewlekariyê hate vexwestin**
- **Deh sal zindan ji kurdekî re!**
- **Li sûriyê du kurd piştî salek zindan serbest hatin berdan**
- **Xwendekarê kurd Aras El Seyid wendayî ye!!**

- **Şemsedîn Hemo hate binçavkirin**

Sûriyê: Divê navên dikanan bibin erebî! 01.07.2009
Şaredariya Qamişlo bi hevkarî û verastina komîteya xurtkirina zimanê erebî re xwedanên dikanan hayedar kir ku divê ew navên dikanên xwe bikin bi zimanê erebî.
Ev biryar bi piranî di derheqê kurdan de hatiye standin û heke pêk neynin dê dikanên wan bêne girtin. Tê zanîn ku li parêzgeha Hesiçayê ereb, kurd, ermen, suryanî û aşûrî bi hev re dijîn û her yek ji wan zimanê wî yê taybet heye.

Xortekî kurd ku wendayî bû vegeriya mala xwe 01.07.2009
Roja 01.07.2009an hate ragihandin ku xortê kurd Isa Şêxî ku beriya çend heftiyan wenda bû bû vegeriya mala xwe.
Tê zanîn ku beriya çend heftiyan ji bajarê hesiçayê diçû bajarê Qamişlo ji bo ku di civîna parvangeha ku tê de kar dike (parvangeha Bêrîkfonan -Ya Hele), beşdar bibe û dora 500 hezar pereyên sûriyê bi wî re bûn daku bide Parvangehê, lê li ser rêya di navbera Qamişlo û Hesiçayê hati bû revandin. Paşê malbata wî nas kir ku ew ji aliyê hêzên ewlekaiyê ve hati bû girtin bêyî ku sedema binçavkirina wî ji wan re bê ravekirin.

Heya aniha çarenivîsa hevwelatî û rojnamevanê kurd Emced Ebdil Rehman Osman ne diyar e! 08.07.2009
Xortê kurd ê rojnamevan Emced Ebdil Rehman Osman ku di sala 1982an ji dayik bûye û ji bajarê Qamişlo ye (Bakurê rojhilatî sûriyê), navê diya wî Hind e, ev bêtirî 2 mehan e ku çarenivîsa wî ne diyar e. Emced Osman ji roja 17.05.2009an ve di dema ku karûbarên xwe li kargêriya mişextî û pasportan pêk tanî, wendayî ye û heya aniha ne diyar e ku ew ji hêla kîjan hêzên ewlekarî li sûriyê hatiye binçavkirin.
Malbata wî ji 6 neferan pêk tê ku Emced bi tena xwe kar dikir daku pariyê nanê wan peyda bike. Emced Osman li sûriyê kovara Hogir derdixist û belav dikir.

Leşkerekî kurd li bajarê Himsê hate kuştin! 08.07.2009
Hate ragihandin ku leşkerê kurd Mihemed Umer Xidir ku ji bajarê Dirbêsiyê ye (Parêzgeha Hesiçayê), navê diya wî Hemdiya ye û di sala 1987an ji dayik bûye, roja 08.07.2009an li leşkeriyê li bajarê Himsê hatiye kuştin. Ji malbata wî re hate ragihandin ku di dema pasvaniyê de çekên ku li leşkeriyê bi kar tînin bi şaşî 6 fîşek jê derketine êdî jiyana xwe ji dest daye. Bi vê bûyerê hejmara leşkerên kurd ên jiyana xwe di dema leşkeriyê de ji dest dane digihê 24 leşkeran!

Ji ber ku wêneyên Mam Celal û Kak Mesûd pê re hatin dîtin, yekser hate binçavkirin. 04.07.2009
Xortê kurd Rodî Mehmûd Şêxo ji Qamişlo-Taxa Xerbî – ye, roja 04.07.2009 an weke dîdevanekî çû bû dadgehê daku mafê takekes yê xwîşka xwe têk bibe.
Xwîşka wî di rûdana turumbêlekê de birîn bû bû, û bi şêwira xwîşk û malbata xwe dixwest karekî mirovane bike, ji bo ajoker ji zindanê derkeve.
Rodî li ber deriyê avahiya dadgehê li bajarê Qamişlo bi destê polîsekî velo bû; di encam de wêneyê serokê Îraqê Mam Celal û wêneyê serokê Herêma Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî di bêrîka wî de hate dîtin.
Ev polîsê hîç îşê wî bi velokirina wêneyan nîne, çimkî tenê ew li çekên agirîn an çekên spî digere. Lê ji şofîniya xwe yekser telefonê ji hêzên ewlekariya konevanî re vedike, ew jî mijarê mezintir dikin û xort dişînin rex Parêzerê Giştî û ji wir dişînin rex Dadgerê Take yê leşkerî. Hate ragihandin ku dê roja şemiyê 11.07.2009 dadgeha wî pêk bê.

Hêzên ewlekariyê êrîş birin ser mala kurdekî û ew binçav kirin 09.07.20099
Hate ragihand ku dora katjimêr 15:30 roja pêncşemê 09.07.2009an hêzên ewlekariya siyasî li bajarê Qamişlo êrîş birin ser mala hevwelatiyê kurd Semîr Izedîn Hisê ji taxa Qenat Siwês li bajarê Qamişlo û ew binçav kirin û heya aniha çarenivîsa wî ne diyar e.

Sê xortên kurd ji qamişlo hatin binçavkirin 13.07.2009
Hate ragihandin ku sê xort ji bajarê Qamişlo ji aliyê ewlekariya komarê ve hatine binçavkirin.Ew jî ev in:
Mihemed Seîd Sebrî (35 salî)
Fehed Ehmed Ebas (28 salî)
Emîr Farûq Salih (28 salî)
Heya aniha ne hatiye diyarkirin ku sedemên binçavkirina wan çi ne, herwiha çarenivîsa wan jî ne diyar e.

Sê meh borîn û hîna çarenivîsa Fewaz Ehmed Hesen ne diyar e 13.07.2009
Di roja 08.05.2009an de hevwelatiyê kurd Fewaz Ehmed li rawestgeha Şemandefiran li Şamê hate binçavkirin. Birêz Fewaz Ehmed hin pirtûkên rêzimana kurdî pê re hati bûn dîtin. Fewaz Ehmed ji bajarê hesiça ye û ji kurdên bênasname ye yên ku di sala 1962an de di rêya serjimartina awarte re nasnameya wan ji wan hatiye kişandin. Birêz Fewaz Ehmed xwest koçberî şamê bibe daku kari be pariyê nanê xwe peyda bike. Lê ji ber ku kar peyda ne kir xwest vegere male, lê nizanî bû ku ev sosret li pêşiya wî ye.

Silêman Cemîl Cafer serbest hate berdan 13.07.2009
Roja 15.07.2009an kesayetiya kurd û namzedê Perlemanê sûriyê yê berê birêz Silêman Cemîl Cafer serbest hate berdan. Tê zanîn ku birêz Silêman şêxekî ola êzdî ye û ji aliyê hêzên ewlekariya siyasî ve li bajarê Helebê roja 15.04.2009an di dema ahenga cejna çarşema sor a Êzdiyan de, hati bû binçavkirin. Paşê bo dadgeha leşkerî hati bû guhastin û sezaya zindanê 3 mehan lê hate birîn bi tewana ku ew endamê rêxistinek siyasî ye û ev tişt qedex ye.

Ji ber ku Mîdya nasnameya wê ya sûrî tuneye, ne hiştin ku biçe Şamê!!! 13.07.2009
Roja yekşemê 19.07.2009an jinek kurd bi navê Mîdya Subhî Ebdellah (31 Salî) xwest ku ji bajarê Qamişloyê biçe Şamê, lê di dema ku asayîşên sûiryê nasnameyên rêwiyan kontrol dikir nas kirin ku Mîdya ji kurdên bênasname ye, yekser wê ji Basê peya kirin û jê re gotin : Qedex ye. Nabe tu bi tu deran de biçî!!!.
Tê zanîn ku di sala 1962an de di rêya projeyê serjimartina awarte ku li parêzgeha Hesiçayê tenê pêk hat, dora 120 hezar kurd nasnameyên wan ji wan hatin kişandin. Ji wê demê ve û heya aniha rewşa kurdên ku bênasname ne, pir xerab e. Ne dikarin tiştekî li ser navê xwe vekin, ne dikarin bixwînin û ne jî dikarin kar bikin. Di der heqê kurdên bênasname çewisandinek bêhampa tê bikaranîn. Aniha hejmara wan bêtirî 300 hezaran e.

Rodî Mehmûd Şêxo azad e 20.07.2009
Hate ragihandin ku xortê kurd Rodî Mehmûd Şêxo yê ku di 04.07.2009an de li pêşiya avahiya dadgehê li Qamişlo hati bû binçavkirin, roja 20.07.2009an ji aliyê dadgerê take yê leşkerî ve li Qamişloyê serbest hate berdan.

Çalakvanekî kurd î mafmend bo şaxê Felestînê yê ewlekariyê hate vexwestin 26.07.2009
Roja 26.07.2009an çalakvanê kurd ê mafmend Birêz parêzer Mesûd Kaso ku ji bajarê Dirbêsiyê ye ji aliyê şaxê ewlekariya leşkerî li Qamişloyê hate vexwestin. Li wê de jê hate xwestin ku divê ew biçe

bajarê Şamê rex Şaxê Felestîn yê ewlekariyê. Di vê dema dawî de rêjîma sûriyê rê gelekî li ber çalakvan, nivîskar, siyasetmedar û rewşenbîrên kurd teng dike.

Deh sal zindan ji kurdekî re! 27.07.2009
Hate ragihandin ku di roja 27.07.2009an de 10 sal sezaya zindanê li birêz Izzet Ibrahîm Seydo hate birîn. Birêz Seydo bi tewan û behaneya ku çekên teqînî pê re hene û avakirina partiyek biratiyê di navbera kurd û ereban de hate sezakirin.

Li sûriyê du kurd piştî salek zindan serbest hatin berdan 27.07.2009
Hate ragihandin ku roja 27.07.2009an hevwelatiyê kurd Salar Mihemed Hisên û xwîşka wî Sûriya Mihemed Hisên piştî salek zindan serbest hatin berdan, lê hîna hevalên wan Xelîl Osman, Cemîl Mehmûd Hiso û Celal Izzedîn Yûsif di zindanê de ne.

Herwiha biryar hate standin ku ew dê heya salekê dûrî bajar û malên xwe bijîn!!
Tê zanîn ku ev 5 hevwelatiyê kurd di roja 28.05.2009an de bi tewana ku têkiliyên wan bi tevgera rizgariya kurdistanê re hene, hati bûn binçavkirin.
Parêzerên wan biryara dadgeha tewankariyan ne pejirand û doseya wan dîsa vegeriya dadgeha tewankariyan li bajarê hesiçayê daku carek din bê ravekirin û şîrovekirin, lê dadgeh ji biryara xwe venegeriya û salek zindan li wan hate birîn.
Tê zanîn ku ev biryar bê dekumentên ku tewanên wan pesend dikin hatiye standin, herwiha rewşa hevwelatiya kurd Sûriya Mihemed Hisên a tenduristî pir xerab e.

Xwendekarê kurd Aras El Seyid wendayî ye!! 29.07.2009
Roja 29.07.2009an hate ragihandin ku xwendekarê kurd Aras El Seyid ku ji bajarê Dêrikê ye û li bajarê Tertûs beşê Endazyariya Tenknîkî dixwîne, ji beriya heftiyekê ve wendayî ye.

Hate ragihandin ku di dema xwendekarên zanîngehan li sûriyê beşekî ji leşkeriya sûriyê di ber xwendina xwe re pêk tînin (Leşkergehên zanîngehî) û wek her carê telefonên wan têne velokirin, di telefona Aras ya destan de wêneyên kurdî hati bûn dîtin (Wêneyên hindek kesayetiyên kurd ên navdar) û ji ber vê yekê hate binçavkirin û heya aniha çarenivîsa wî ne diyar e.

Şemsedîn Hemo hate binçavkirin 29.07.2009
Roja 29.07.2009an dora katjimêr 10:00 birêz Şemsedîn Hemo endamê komîteya ramyarî ya Partiya Yekîtî ya kurd li sûriyê ji hêla ewlekariya siyasî ve li bajarê Helebê hate vexwestin û heya aniha çarenivîsa wî ne diyar e.